# Polên derfetê û xwendegehên amadeyî bijartî

## Agahdarî ji bo dêûbav û lênêrînvanan

### Polên derfetê çi ne?

Polên derfetê ji xwendekarên Sal 5 û 6 yên rewşenbîr e jêhatî û bi pêkana bilind peyda dibin. Li seranserê NSW 87 xwendegehên bi polên derfetê (di nav de polên xwendina ji dûrve) hene ku beşekin ji sîstêma perwerdehiya giştî.

### Xwendegehên amadeyî yên bijartî çi ne?

Xwendegehên amadeyî yên bijartî ji bo xwendekarên lîseyê yên jêhatî ye rewşenbîr û bi pêkana bilind ji Sal 7 heya 12 heye. Hevdeh xwendegehên ku bi tevahî bijartî hene, 26 xwendegehên amadeyî yên beş bijartî hene, 4 xwendegehên amadeyî yên bijartî ye çandiniyê (hinek bi tesîsên konseyê) û xwendegeheke amadeyî ya bijartî ya fêrkirina ji dûr ve heye.

### Feydeyên ji beşdarbûna poleke derfet yan lîseya bijartî çi ne?

Lêkolîn destnîşan dike ku xwendekarên bi pêkan û jêhatî hewcedariyên fêrbûn û bextewariyê yên taybetî hene. Di polên fersendê û lîseyên bijarte de fêrbûn ji bo peydakirina asteke guncan ya dijwariyê bi zarokên xwedî şiyana wek hev re hatî çêkirin. Gelek xwendekarên bi pêkana bilind û jêhatî radigihînin ku dema ew bi hevtemenên bi şiyana wek hev re têne kom kirin hestekî aîdiyetê û têgihiştinê hest dikin.

### Ez dê çawa bizanibim ku zaroka/ê min jêhatî ye?

Zarokên ku pêkana wan bilind e yan jêhatî ne, mêl dikin ku:

- bi tundî meraq dikin
- zû û bi hêsanî ramanên nû yan jêhatîbûnên nû fêr bibin
- bîreke baş hene
- pirsên aloz dipirsin
- afirînerin
- kêfa wan ji ramana aloz dihêt
- dema fêrbûna tiştên nû kêm hewceya wan bi dubarebûnê heye
- di qada xwe ya pêwindîdar yan jî di azwerîyê de pir baldarin.

Heke zarokê we gelek ji van taybetmendiyan nîşan dike, tê pêşniyar kirin ku hûn di pêşkêşkirinê de bifikirin.

## Xwendekar çawa mafê pêşkêşkirinê hebe?

Xwendekar îmtîhaneke belaş pêk tîne.

Îmtîhana pola derfetê sê hêmanên li pey hev hene:

- xwendin
- ramana matematîkî
- jêhatîbûna ramanê.

Îmtîhana bicihanîna lîseyê ya bijartî çar hêmanên li pey hev hene:

- xwendin
- ramana matematîkî
- jêhatîbûna ramanê.
- nivîsandin

## Cîhgirtina Wekheviyê

Wezaretê Modêleke Cîhgirtina Wekheviyê sepandiye da ku nûnertiya xwendekarên potansiyel û jêhatî yên ji komên kêm-nûner zêde bike. Di bin vê modêlê de ji sedî ji cîhan têne girtin:

- xwendekarên di civakên xwedî feydeyeke kêm ya perwerdeya civakî
- xwendekarên Aborijinî
- xwendekarên li gund û herêmên dûr
- xwendekarên ku seqetî hene.

Xwendekarên ji her koma wekheviyê dê bi daneyên pêşkêşkirî werin nasîn, û yên ji alîyê daîreyê ve hatine helgirtin. Ji bo bêtir agahdarî biçin: https://education.nsw.gov.au/schooling/parents-and-carers/choosing-a-school-setting/selective-high-schools/fair-access

## Ma hewceya ku xwendekar ji bo imtîhanê praktîs bikin?

Îmtîhana cihgirtinê ji bilî jêhatîbûnên ku dikarin bi fêrbûna rêkûpêk ve werin rêve birin, xwendekarên xwedî jêhatîbûna ramana rexneyî ya awarte nas dike. Divê xwendekar li ser malpera Wezareta Perwerdehiyê li îmtîhanên bicîhkirinê binêrin da ku pê ewle bin ku ew forma testê nas dikin. Divê dêûbav zanibin ku delîlekî pêbawer tune ku perwerdehiya berfireh ji bo imtîhanê cûdahiyekê çêbike.

Hûn dikarin îmtîhanên pola derfetê yên berê li vir bibînin: https://education.nsw.gov.au/schooling/parents-and-carers/choosing-a-school-setting/selective-high-schools/placement-test/opportunity-class-practice-tests

Hûn dikarin îmtîhanên cîhê lîseyê yên bijartî yên berê li vir bibînin: https://education.nsw.gov.au/schooling/parents-and-carers/choosing-a-school-setting/selective-high-schools/placement-test/selective-high-school-practice-tests

## Kî dikare pêşkêş bike?

- Xwendekarên ji xwendeghên seretayî yên hukûmî û ne-hukûmî li NSW dikarin pêşkêş bikin.
- Pêdivî ye ku xwendekar hemwelatiyên Australya yan New Zealand e bin yan niştecîhên daîmî yên Australya bin ku beşdarî pola derfetê bibin.
- Xwendekarên navnetewî û derveyî welêt dikarin pêşkêş bikin heke malbata wan dê di dema qeydkirinê de li NSW bijî û nîyet bikin ji bo dema xwendinê li NSW bimînin.
- Malbatên ku ji berê pêşkêşe runiştina daîmî kirine û belgeyên wan ji Wezareta Karên Hundir hene ku hêvîyeke maqûl didin wan ku berî encamên bicihkirinê bên agahdarkirin, mafê pêşkêşkirinê jî hene.

## Pêşkêşkirin kengî vedibin?

Pêşkêşkirin dema ku xwendekar di polên derfetê yên sala 4 de û ji bo lîseyên bijartî di sala 5-an de vedibin. Dîrokên pêşkêşkirinê yên sereke û agahdariyên din li ser malpera wezaretê hene. https://education.nsw.gov.au/schooling/parents-and-carers/choosing-a-school-setting/selective-high-schools/application-process

## Ez çawa dikarim ji bo zarokê xwe pêşkêş bikim?

- Pêdivî ye hemî pêşkêşkirin li ser internêtê bêne temam kirin: https://shsoc.education.nsw.gov.au/
- Pêşkêşkirin divê bi Îngilîzî were tijikirin.
- Dêûbav dikarin du xwendegehên dersên derfetê û heya sê xwendegehên bilind yên bijartî helbijêrin. Divê ew bijartinên xwe bi rêza xwe ya bijartî li ser formê xuya bikin. Cihê ku xwendekar ji xwendegehekê zêdetir maf hebe, dê tenê bijartina yekem ya xwendegehê ji wan re were pêşkêş kirin.
- Dêûbavên seqet yên ku seqetiya wan nahêle daxwaz li ser internêtê were temamkirin, pêwîste alîkariyê ji Tîmê Xwendekarên Asta Bilind daxwaz bikin 1300 880 367.
- Ji bo pêşkêşkirina formê yan bicihkirina têstê belaş e.

## Ji bo şandina kaxezan yan ji bo rûniştina imtîhanê belaş e

Polên derfetê li xwendegehên hukumî yên NSW li seranserê wîlayetê ne û li vir tên dîtin: https://education.nsw.gov.au/schooling/parents-and-carers/choosing-a-school-setting/selective-high-schools/choosing-a-school/opportunity-classes#findoc

Xwendegehên bilind yên bijartî xwendegehên hukumeta NSWn û li vir tên dîtin: https://education.nsw.gov.au/schooling/parents-and-carers/choosing-a-school-setting/selective-high-schools/choosing-a-school/selective-high-schools#findshs

## Polên derfeta ji dûrve û xwendegeha bilind e bijartî ya ji dûrve

Ger hûn li devereke gundewarî yan dûr in, dibe ku zarokê we maf hebe ku pêşkêşe xwendina li Aurora College bike. Ev xwendegeha hukumetê dersên derfeta ji dûrve û lîseyeke bijartî ya ji dûrve heye.

Xwendekar diçin xwendegeha xwe ya giştî ye herêmî û bêşdare konfiransa ser înternêtê ya pola derfetê yan polên lîseyê yên bijartî dibin.

Xwendekarên li xwendegehên di dersên derfetê de, yan li xwendegehên di nav deverên xêzkirinê yên dersên fersendê yên heyî û lîseyên bijartî de ne-mafdar in ku pêşkêşe têketina Aurora College bikin.

## Ez dikarim bêtir agahdarî ji ku werbigirim?

- Agahiyên pêşkêşkirinê li ser malpera https://education.nsw.gov.au/schooling/parents-and-carers/choosing-a-school-setting/selective-high-schools bixwînin.
- Emaila Pêwindiyê bi Tîmê Xwendekarên Asta Bilind re bike ssu@det.nsw.edu.au
  Telefon: 1300 880 367
- SHS Facebook: https://www.facebook.com/groups/772251106301086/
- OC Facebook: https://www.facebook.com/groups/159342048077050/

## Xizmeta wergera telefonî

Ger hewceya we bi wergêr hebe ku alîkarîya lêpirsîna we bike, ji kerema xwe telefone xizmeta wergêriyê bike bikin 131 450, zimanê hûn diaxafin daxwaz bikin û hejmara telefonê ji operatorê re bêjin. Operator dê telefone hejmarê bike û wergêr li ser xetê peyda bike da alîkarîya we bike. Ev xizmet bi belaşe.